



BULTENA ÇANDINIYÊ

Di 20 salên dawî yê serdema îqtîdara AKP'ê de tevî Wezîrê Çandinî û Daristanê yê dawî Vahîr Kîrîşçî 9 wezîrên çandiniyê ji peyvîrê hatin girtin. Beriya ku AKP bê îqtîdarê di hilberîna çandiniyê de ya bi giranî diyarker çotkar bûn. Ji ber çotkar diyarker bûn, Tirkiye di çandiniyê de berhemên çandiniyê îxrac dikir. Lê di 20 salên dawî de piştî AKP hat îqtîdarê Tirkiye di qada çandiniyê de bi destê hêzên sermayeyê yê navdewletî de hişt. Tirkiye di aliyê hilberînê de têk çû û êdî her tiştî ji derve îthal dike. Di qada çandiniyê de bûye welatê ku îthal dike.

Karneva Çandiniyê ya Wezîrê Çandiniyê Bekir Pakdemîrlî

No	Qada Xebatên Çandiniyê	Baş	Pir Baş	Xerab	Pir Xerab
1	Hilberîna Çandiniyê			X	
2	Karkerên Çandiniyê yê Demsalî				X
3	Îthalata Çandiniyê		X		
4	Îthalata Berhemên Çandiniyê			X	
5	Keda Çandiniyê				X
6	Mafê Çotkaran				X
7	Hevkariya Sermayeyê		X		
8	Di çandiniyê de wekhevîya zayendî				X
9	Serdestiya Xurekan				X
10	Ewlehiya Xurekan			X	
11	Ewlekarîya Zexîreyan				X
12	Di çandiniyê de bikaranîna jahrê	X			
13	Devnê Çotkaran				X
14	Mûçeyên Brokratan ên Wezaretê Çandiniyê		X		
15	Çandiniya Ekolojîk a Agro				X
16	Tovê maka resen				X
17	Tovê bi GDO û bi Hîbrît	X			
18	Sewatên daristanan				X
19	Talankirina darên zeytûnan	X			

GÜNÜ
IALARI
—
ICELİ
ER VE
CÜLTÜR

Wezîrê Çandiniyê Bekîr Pakdemîrlî di pêvajoya 4 salên wezîrtiyê de her çend dersên hevkarîya xwe ya bi sermayedaran re baş bû, her çend di îthalata çandiniyê de baş û her çend di dayîna mûçeyên buroratan de baş bû jî; di dersên qada keda çandiniyê, serdestiya xurekan, kedkarên densalî yê çandiniyê û di çandiniyê de wekhevîya zayendî de pir xerab bû. Bi notên xerab tev li karwanê Wezîrên AKP'ê yê nesorkeftî bû. Îqtîdara AKP'ê ji bo têkçûna çandiniyê bike sûcê wî ew ji wezaretê dûr xist.



AKP'ê, Ofîsa Berhemên Axê kiriye Ofîsa Berhemên Îthalatê!

- Ofîsa Berhemên Axê, di sala 2006'an de di nava berhemên axê de ji sedî 99'ê berhemên axê ji çotkarên Tirkiyeyê dikirî. Di sala 2020'an de jî ji sedî 19'ê berhemên axê ji çotkarên Tirkiyeyê dikire. Ji sedî 81'ê berhemên axê jî bi rêya îthalatê ji derve dikire.
- TMO di sala 2006'an de 4,3 mîlyon ton genim ji çotkarên Tirkiyeyê dikirî. Di sala 2020'an 4 milyon ton daket û 384 hezar ton kirî. Ji zêdeyî 4 milyon tonan dasket hezar tonî. TMO di sala 2020'an de 3,7 milyon ton genim îthal kir. Di Hezîrana 2021'an de nezî 4 mîlyon ton genim îthal kir.
- TMO, piştî bunayê Berbiroj (gulberoj) zêde bû, ji Rusyayê 18 hezar ton rûnê Gulberojan îthal kir.

Di mehên Çile û Sibatê de ji ber hin dahatiyên cotkariyê buha hatibû daxistin lê bi zemên ku di maha Adarê de hat kirin ev hat jibîrkin!

- Di meha Sibatê de Erdogan ji sedî 12 êmê sewalan daxistibû lê piştê ji sedî 30 zem hat kirin. Zema ku ji aliyê Kooperatîfa Cotkaran a Qirediyê ve hat kirin buhayê êmê 202 TL yî derket 265 TL yî.
- Di meha Cotmeha borî de buhayê 5 litre Rûnê Gulberojan bi 80 TL yî bû, bi bilindbûna dolar re ev buha di meha Kanûnê de derket 160 TL yî. Di meha Adarê de derket 250 TL yî û niha jî rûnê herî kêr 200 TL ye.
- Ofîsa Berhemên Cotkariyê (TMO) di 27'ê Adarê de aşkera kiribû ku dê 5 litre Rûnê Gulberojan bi 129 TL yî bifiroşe. Lê ji ber ku rûn nema ye careke din serî li îthalatê daye. Rûsya jî heta meha Tebaxê kotaya 1,5 milyon ton danî ser îxracata rûn.
- Turkşekerê nêzî çar meh berê destnîşan kiribû ku dê tenê şeker bifiroşin marketan. Lê ji wê dîrokê ve ji sedî 165 zem hat ser şeker û 50 kîlo şeker ji 265 TL yî derket 710 TL yî. Harî dawî Turkşekerê buhayê li ser şeker nûjenî kir û kiloya şeker ji 5,96'an derxist 7,10'an û ji bo îmalatxaneyan jî torbeyê şeker kir 550 TL.
- Saziya Şîr û Goşt (ESK) ji sedî 48 zem kir û li gorî vê rewşê kiloya qiyme ji 56 TL yî derxist 83 TL yî û kiloya goştê sor ê hûr jî ji 62,5'an derxist 92 TL yî.
- *Di meha adarê de bihayên gubreyaya can wek 8 hezar TL, gubreyaya ure 14 hezar û 250 TL, gubreyaya 20:20 11 hezar û 700 TL, gubreyaya 15.15.15 jî 12 hezar û 300 TL, hatin nûkirin



- Li gor daneyên TUÛK'ê di meha adarê de enflasyona salane ji sedî 61,14, li gor Turk-Îş'ê enflasyona salane ji sedî 76,39 û li gor ENAG'ê jî enflasyona salane ji sedî 142,62 ye. Li gor daneyên Turk-Îş'ê sînorê birçîbûnê yê malbateke ku ji çar ferdî pêk tê 4 hezar û 928 TL ye.
- *Li gor TUÛK'ê di van berhemên çandinîyê de enflasyona salane bi vê rêjeyê pêk hatiye; Kartol ji sedî 207, xiyar ji sedî 193, balîcan ji sedî 185, virzole(dereotu) ji sedî 158, dolmik (kundir) ji sedî 154, qirnebît ji sedî ji sedî 146, xes ji sedî 146, kelem ji sedî 139, bexdenûs ji sedî 139, ispenaq ji sedî 133, pûjan ji sedî 129, fringî ji sedî 126, îsot ji sedî 88, gezer ji sedî 83, tivir ji sedî 74, pirasa ji sedî 70, karok ji sedî 61, pîvazên hişk ji sedî 56.
- Li gor daneyên TUÛK'ê bihayên berhemên xurekan bi vê rêjeyê zêdebûne; Rûnê nivîşk ji sedî 160, nok ji sedî 118, hêk ji sedî 98, nîsk ji sedî 95, mikarne ji sedî 95, goştê mirîşkan ji sedî 86, arvan ji sedî 83, masî ji sedî 77, goştê golika ji sedî 76, nan ji sedî 74, rûnê gulberojan ji sedî 70, av ji sedî 64, goştê berxa ji sedî 58, şekirê hûr ji sedî 57, rûnê zeytûna ji sedî 57, penîrê spî ji sedî 54, şîr ji sedî 46.

• Buhayê hin berhemên çandinîyê vên sereke û rêjeya zêdebûna wan

<u>Berhem Kg</u>	<u>Buhayê Zevivê</u>	<u>Buhayê Hala Mêrsînê</u>	<u>Buhayê Hala Stenbolê</u>	<u>Buhayê Serfxur</u>	<u>Buhayê Serfxur ê berê</u>	<u>Bihayê Serfxur ê sala berê</u>
<u>Îsot</u>	4-8 TL	10-20 TL	15-30 TL	30- 50 TL	17- 40TL	8-12 TL
<u>Firengî</u>	1-7 TL	2-13 TL	25- 40 TL	20-45 TL	10-22 TL	3-8 TL
<u>Kartol</u>	0,25-3 TL	2-5 TL	3-13 TL	8-16 TL	7-12 TL	3-5TL
<u>Pîvaz</u>	1-5 TL	2 -7 TL	3-8 TL	5-15 TL	3-8 TL	1,50 -4 TL
<u>Bacan</u>	3-15 TL	5-20 TL	20-30 TL	32-40 TL	15-22 TL	3-7 TL
<u>Sêy</u>	2- 7 TL	3 -9 TL	5-10 TL	15-25 TL	12-30 TL	7-10 TL
<u>Purtegal</u>	1- 2 TL	3-6 TL	3-10 TL	3-12 TL	5-12 TL	5-8 TL
<u>Hirmî</u>	1-5 TL	2 -10 TL	5- 15 TL	12-30 TL	13-17TL	4-8 TL

Nîse: Buhayê berheman li gorî lécûnên zêde û galîteya berheman tê guhertin.

